**NIRXANDIN: TENGEZAR MARÎNÎ**

„Evîn Di Nav Sîbera Alên Tarî de“ Halim Youssef. Weşanxane:
Sujet, Bremen. Dema weşanê: 15ê Îlonê, 2025 Rûpel: 233 Biha: €19.80 (Bergê Nerm) Werger: Ji Kurdî ji hêla Elisabeth Ruetz ve. ISBN: 978-3-96202-151-1

„Di nav himeguma mirinê de, carinan tiştek heye, ku ji her alekê xurttir e vedibe.“
H. Youssef

Halim Youssef, dîdevanekî kurd e, ji Sûriyeke jihevketî û aloz tê, ji destpêka sala 2000an ve li Elmaniya sar dijî, ”Evîn, di bin Sîbera Alên Tarî de” tevnekê ji şoka bi hêz û dilovaneyê vedihûne. Romana wî labîrenta reş a şer bi çirûska şermok a evînê re dike yek – perenga di nav zirxê tundûtûjiyê de jî bi awayekî nevemirî diçirise. Ev berhema ku bi zimanê Kurdî ji dayîk bûye, jixwe ronîyeke serfiraz e, ji sînorê romansiyeke sade wêdetir diçe: ew dengekî wêjeyî ye, peykerekî bêhempa yê berxwedan, rûmet û jinbûna bêhempa û wêrek e.

Destpêk, ji herêma li ser sînorê Sûrî-Iraqê gur dibe, ku alên reş ên DAIŞê mîna kefenên mirinê ber bi ba dibûn. Di navbera sînorên parçekirî û qûma zêrîn û bêdengiyeke seyr de, çarenûsa Rodî, şervanek ji bo azadiya kurd, û Perwîn, şervanek eYPJ, ku bikêrhatî û semaxa wê jî hemen wekî êşa wê ya veşartî bi xwe ve girtiye.
Evîna wan, ya ji derzên tirsê hatiye afirandin, di mirwarên bedewiyê yên demkî de geş dibe: nihêrîneke dizî, nehêniyek, şeveke di bin ezmanê çol û beyaran bi stêrkan xemilandî bi elmasan in.

H.Youssef vê gerdûnê bi zimanekî mîna kêrê xêz dike, mişt bi helbestvaniyeke kûr. Hevokên wî, kurt û birbirî, mîna ku di toz û barûtê de hatibin şûştin, dikevin nav kûrahiyên helbestvaniyê - kêliyên ku nivîs bi xwe diqelişe, bêhna xwe digire, bizavê dike, ku tiştên negotî di nav peyvan û xêzan de cih bide wan.
Wergêrvana vê romanê, Elisabeth Ruetz, vê lerizînê mîna perestgeheke pîroz diparêze: ew ne tenê kîteyan, lê lêdana dil a berxwedanê, bazdanên di bêdengiyê de, ronahiya di navbera hêvî û kûrahiyê de vedibêje.

Perwîn wekî xaleke veşartî ya vê gerdûnê radibe.
Ne pêşkêşiyeke îdealîzekirî ye, lê jineke ji goştê lêdanê, xwîna herikî û bîranînên pişguhxistî ye.
Di romanê de, tiştê ku Youssef di nav gelê xwe de dihelîne, krîstalîze dike: Ew keftlefta ku çirûskên jiyanê ji xweliyê diafirînin.
Evîna wê ji bo Rodî ne melhemek e bo aram û hêminkirinê, lê kiryarek e, devjixweberdan e- nazik wekî cama tenik, nakok wekî bahozekê, bi sûcdarî û tirsê ve girêdayî, û xwedan resenetiyeke bihêz e.

Carinan, berçavkirina tundiya cîhana hunandî ye, temaşevan dixe bin bandora xwe de: Tabloyên bi hûrgilî, bi zorê dihêlin ku ba bihêt.
Lê di vê newestiyanê de, kevirê rewişt, sinc û exlaqî yê Yuossef heye.
Ew fermanê dide me, ku em çavên xwe bigirin.
Wêjeya wî ne penageheke revê ye, lê qadeke hevdîtina bênavber e.

Dengvedan, di: "Evîn di nav sîbera alên tarî" de, berdewam dike, me dihejîne, me bi wan wêneyên ku dişewitin de, di dengên ku diçirisin de, di lalbûn û bêdengiyên ku diqîrin de, li ber tabloya mirovahiya îroyîn dideyne.
Halim Youssef li dijî jibîrkirinê, li dijî bêdengiyê dinivîse.
Romana wî hem gunehbarkirin û hem melodiyeke xwedayî ye, hem qeydeke dîrokî ye û hem jî tîtalên paşerojê ne.
Ji bo kesên ku dikarin dengên awazên di semfoniyên Hîşam Matar an Xalid Hosseini de têbigihin, ev berhem gewherek e - û ceribandinek tal di formê herî bilind de ye.

**Biyografi**

Tengezar Marini, 4 Eylül 1959'da Suriye Kürdistanı'nda doğdu. Yazar, ressam ve sosyal hizmet uzmanı olan Marini, şu anda bir mülteci barınağında çalışıyor. Ayrıca gönüllü olarak mültecilere ve evsizlere danışmanlık hizmeti veriyor.
Uzun yıllardır radyo ve dijital televizyon kanallarında çeşitli edebi ve siyasi programlar düzenlemektedir. Sadece Almanya'da değil, birçok Avrupa ülkesinde, Irak'ta, Türkiye'de ve Suriye'de de konferanslar ve okuma etkinlikleri düzenlemektedir.
Marini, Kürtçe olarak çeşitli dergi ve gazetelerde düzenli olarak edebiyat eleştirisi kitapları ve makaleleri, siyasi denemeler ve şiirler yayınlamaktadır. Ayrıca, seçilmiş şiirleri veya metinleri ile Alman yazarları tanıtarak Alman edebiyatını tanıtmakta ve "Unter der Lupe" (Büyüteç Altında) başlığı altında uluslararası edebiyatı geniş bir kitleye ulaştırmaktadır. Bunun yanı sıra, Kürtçe ve Almanca dillerinde birkaç şiir kitabı yayınlamıştır.
Yaratıcılığı sadece şiirlerinde değil, resimlerinde ve Hannover şehrinde çok yönlü kültürel faaliyetlerinde de kendini göstermektedir. Edebiyata özel bir tutkusu vardır: İnsanları edebiyata ilgi duymaya teşvik etmek, edebiyatı anlaşılır kılmak ve edebiyata olan ilgiyi artırmak onun için büyük önem taşımaktadır.